


Dengê me



KOVARA RAMYARÎ O ÇANDÎ YA DU-MEHÎ

Sal: 1 Hejmar: 1 Gelawêj-Rezber 1998

- * Çima Dengê Me?
- * Edî bi zimanê xwe bijîn!
- * Ulusal birlik ve itifak sorunu
- * Jiyana Rêkxistinî û rêbazên Têkoşînê
- * Şoreşa Kurdîstan û Rola 'Bakûr' û Partîya
me
- * Sömürgeci güçlerle ilişkiler ve tavrımız
- * Ji bo Jiyanekî nû gavekî girîng
- * Legal-illegal mücadele diyalektiği
- * Riya Birêkxistina Gel
- * Gençlik üzerine
- * İsyân Ateşi



Hatip Kapçak




Hüseyin Aydın

TÊKOŞÎNA WE
RÊYA




Necla Baksî

RONÎ DIDE
ME!



"Şan û mezinahî bi te dikeve
welatê delal û abadin
şan û şeref bi wan dikeve
yên ku qurbana te bûne
Gelî şehîdho... şehîdên welêt
mêr, mêrxas hûn in;
û yên ku didin ser şopa we
û min a we divên bêne kusti



Li Girtîgeha Ewênek,

Necmettin Büyükkaya bi navê dîlên doza PYSK Urfan Alparslan

EM ÇIMA DEDİKEVİN O ÇIMA DENGÊ ME?

Xwendewanên delal,

Ji kûranîya dil de, bi germa azadîxwazîyê, bi evîna hezar salî MERHABA ji we ra!

Me bi hêvî û evînekî dilşahî biryarek girt, ku ji vir pê de, keda xwe, ramanên xwe di rûpelên kovarekî de binirxînin. Lê, em dizanin ku çapkirîna kovarekî ne hêsan e. Divê di hemû qadan de hinek derfet hebin. Berîya her tiştî, di hêla aborî û teknîkî de kêmasî çênebin. Lê mixabin, yên ku vê kovarê, ku niha di destê we de ye, çapdikin hemû di destê dewleta dagirker de dîl in. Lê ev dîlîya han ji alîyê dijmin ve wek rewşekî objektîf bê xuya kirin jî, ji alîyê me de, ev rewş û hoyên em tê de ne, rûpeleke têkoşîna şoreşê ye. Ji ber vê yekê, me biryar girt û dest bi vî karî kir. Lê dîsa jî, em baş dizanin ku hoyên em tê de dijîn û rewşa ku em têde ne hinek kêmasîyên wek kelemên asê dixê ber me. Armanekî me jî jê ewe ku wan kêmasîyan ji holê rakin! Edî di hêla serfirazîyê de em biryara herî mezin ji xwendewanan re dihêlin.

Rast e, serfirazîya kovarekê di çapemenîya wê de xûya dibe. Lê, ev kovara ku em çapdikin ne kovareke "profesyonel" e. Armanca me jî ne kovareke bi vî rengî ye. Lewre, ev kesên ku "nivîskarên" Dengê Me ne, ne kesên nivîskar û profesyonel in. Hinek jê ev cara yekemîne ku nivîsarekê dinivîsînin, hinek jê bi bîr û zanîna xwe dûrî vê xebatê ne. Ji ber vê yekê, em dizanin ku di van nivîsan de, ji hêla rêziman, rênivîs û tîprêzîyê ve gellek kêmasîyên me hene û wê çêbibin jî. Lê armanca me ew e ku, him van kêmasîyan ji holê rakin him jî di hêla zanabûnê de, xwe û kesên hawirdorên xwe geş

bikin. Em li hemberê rexnan, ne girtî ne!
Rexne û rênîşandana dost û hevalan, wê ji me
re bibin çira û me ji kêmasî, xeletî û
astengîyan rizgar bike.

Xwedîyê Dengê Me niha heşt kes in. Lê
daxwaza me, hemû xwendevan û rêheval jî bibin
şîrîkên me. Derê me ji hemû dost û hevalan re
vekirî ye. Ger hinek bixwazin bibin mêvanên
me, em ji niha ve ji wan re dibêjin: "Hûn xêr
hatin!"

Di hoyên zîndanê de çapkirina kovarekê
gellek zor e. Lewre hinek astengî hene,
mirov nikare zû bi zû wan ji holê rake. Lê,
em "çîyayî ne", hinekî serhişk in. Ji me re
dibêjin zarojên agir, em ê vê astengî û
zoratiya hanê bi saya zanayî û bawerîyeke
dewlemend bin dest xin. Em bi xwe bawer in!

Dengê Me, du mehan carek tê çapkirin û
ji bîst rûpelan kêmtir nabe. Di derheqê hemû
qadên jîyanê de, bi dîtineke şoreşgerî
nivîsên cûda cûda di kovara me de dikare cîh
bigire. Lê di dîtîna ramanan de her nivîskar
berpirsiyarê nivîsa xwe ye. Dengê Me, bi
dîtineke rexnegirî li pirsgerêkan dinihêre û
vê dîtîna rexnegirî tu carî bi awayekî tovê
dijmînatî naparêze. Dengê Me, her tim
berjewendiyên gelemperî li pêş digire û bi
dostan re bi zîmanê dostayî, bi dijmin re bi
zîmanê dijminatî dipeyive û diparêze!..

Bi kurtayî, Dengê Me, di zîndana
Ermenekî de hat dinê, lê daxwaz û helwesta
me ew e ku li derva di hoyên azad de, bi
serfirazîyeke dirêj jiyana xwe berdewam bike.
Hêvîyeke me ya din, Dengê Me ji bo hinekan an
jî ji yên hêvîyên me diçilmisînin re bibe
mînak! Di bin tîrêjên Roj de em daxwazên xwe
yên germî ducar dikin û bi qêrîneke xurt
dibêjin HETA HEJMAREK DIN BIMÎNIN DI XWEŞIYE
DE!..

ÊDÎ BÎ ZIMANÊ XWE BÎJÎN

Di jîyana civakî de ziman cîhekî pir girîng digire. Di dîroka netewan de jî, cihê ziman cûda ye. Yên ku bi karê ramyarî ve mijûl dibin, dizanin ku di çêbûna netewan de ziman şertekî bingehîn e. Wek hemû gelên bindest di jîyana gelê Kurd de jî, rola ziman pir girîng e û peywirên mezin bicîh tîne. Yek ji wan peywiran jî avakirin û bipêşxistina fikra netewî ye. Jixwe di vê nivîsarê de armanca min a yekemîn ev e ku bala rewşenbîran bikşînim ser vê babetê û di bin hayên îroyîn derewşa zimanê Kurdî raxim ber çavan. Ez hêvîdarim ku ev nivîsar wê li gor hayên ku em dijîn bê xwendin û şîrovekirin.

Gava ku mirov ji alîyê zimanê Kurdî ve li rewşa rewşenbîr, xwendevan û rêxistinên Kurd dinêre tabloyeke baş nayê dîtin. Gelek sedemên vê nebaşîyê hene, lê rewşa ku em tê de ne, dilê mirov jî kûr de diêşîne, diaciqîne; tîrêjên vê êşê di laşê mirov de cih digire û meriv pê aciz dibe. Lewra heta van salên dawî girîngiya vê pirsgerêkê baş nehati bû famkirin. Pîranîya kadroyên siyasî, hînbûna zimanê zikmakî karekî vala didîtin; lê em dizanin ku di têkoşîna rizgarîya netewî de ziman çêkeke mezin e. Gava ku ev çek baş bê famkirin wê gel, zêdetir li daxwaz û armancên xwe yê ramyarî (siyasî) xwedî derkeve.

Îro li çar perçên Kurdistan'ê, ramyarên pişavtinî tê doomandin. Hemû dewletên dagirker dixwazin ku gelê Kurd hertim bê ziman, bê maf û bê rêxistinbimîne. Li gor dagirkeran kesên ku mafên gelê xwe û jîyaneke rêxistinî dixwazin û diparêzin "xayin in" û neyarê sazûmana îroyîn in. Ji ber vê yekê bi hemû mecal û hêzên xwe, jîyanê li van kesan

gedexa dikan. Di serê wan qedexan de jî ziman tê. Lewra ziman, mirovan wekî netewî bi hev re girêdide û di jîyana civakî de pêwendîya nav mirovan pêktîne. Di hemû qadan de dan û standin bi alîkarîya ziman çêdibe. Em hemû dizanin ku di hayên çêbûna netewî de yekîtiya ziman pêwîstîyeke mezin e. Bê guman dijmînên me jî, vê rastîya han dizanin. Ji ber vê yekê ye, dijmîn qet naxwaze em li zimanê xwe xwedî derên û bi zimanê xwe jîyana xwe bidomînin. Ev rewşa han bi awayekî li çar parçên Kurdistan'ê navdêr in.

Gelê Kurd, îro li hemû hawîrdara welatê xwe şîyar bûye, li deza xwe ya netewî xwedî derdikeve û agirê têkoşînê geş dike. Ji bo ku di demeke nêzik de rojên azad û serbixwe pêk bê, gelê Kurd di hemû qadên ramyarî de şer dike. Şerê çandî û hunerî jî, yek ji van e. Di wan salên dawî de gellek xebatên giranbiha tîn domandin. Kovarên Kurdî, pirtuk û rojnamên Kurdî êdî tîn weşandin. Ji xencî vana, îro mecaleke pir girîng û hêja ketîye destê gelê Kurd. Ew vêneguhez e. Wekî ku hûn jî dizanin îro li hemû derên Kurdistan'ê temaşa kirina MED-TV mumkun e. Ji xencî vê radyoyên Kurdî hene. Ji bilî van kovar, rojname û pirtuyên ku bi Kurdî tîn weşandin hene. Bi qasî ez dizanim îro li Tirkîyê, Welatê Me, Armanç, Nûbihar û Rewşen bi piranî bi Kurdî tîn weşandin. Ronahî, Roj û stêrka Rizgarî jî di rûpelên xwe de cîh didin zimanê Kurdî. Ji bo hînkirina ziman, ev mecalên gellek baş in. Heta ku ji destê me tê, divê em zor bidine hînkirina zimanê zikmakî û derfetên ku di destê me de nebaş binirxînin. (an jî bidin nirxandin).

Hînkirina ziman wezîfeya herkesî ye. Lê ya mezin dikeve para rewşenbîr û pêşvebîran re. Çiqas ku wînda kirinaziman bi poyîtikayên

pişavtinî ve girêdaye jî dîsa di vî karî de alîkarîya rewşenbîran jî heye. Ji ber vê yekê pêşvebirina ziman wek barekî giran li ser rewşenbîran e. Rewşenbîr, welatparêz, şoreşger, sosyalîst û xwendevan hemû di vî warî de xwedî berpirsiyarîyê ne. Di têkoşîna azadî û serxwebûnê de "rola" wana cihekî giranbiha digire. Ger di jiyana civakî de be, an jî di cihekî din de be, divê ev kesên han li hemberê derdora xwe wekî mînakeke balêş bijîn. Lewra di jiyana civakî de rewşenbîr wekî neynikê ne, rewşa gel ya çandî, hunerî û siyasî di vê neynikê de xûya dibe. Em hemû dizanin ku rewşenbîr her tim gavek li pêşîya gel dimeşe. Di qada hilberîna çandî de rola rewşenbîranpir girîng e... Divê rewşenbîrên me ji bo hînkirina zimanê zikmakî, pêşengîya gel bikin. Ji bo yekîtiya ziman divê xebatên akademîk kûr bikin û dezgehên akademîk saz bikin. Pêşengîya vî karî dîsa li ser milê rewşenbîran e.

Hêzên dagirker dibêjin ku zimanê Kurdî nikare hewcedariyên jiyanêke civakî têr bike. Ji ber ku em rê nedin van dîtinên çewt, divê em zimanê xwe li ser bingeheke zanistî bidin rûniştin û bala xwe bidin qeydên rêzimanî û jê re rêyeke nûjen bibînin. Ji bo vî karê zanistî jî, divê rewşenbîr, zimanzan û pispor zû dest bidin hev û di bin dezgehên ziman de karekî akademîk bidomînin. Îro ji alîyê qeydên rêzimanî ve tevlihevîyek mezine heye. Kesên ku ji nû ve des bi hînbûna zimanê Kurdî dikin, pir tengasîyan dijîn. Divê ev tengasî û tevlihevîyaaa han di demeke nêzîk de bê rakirin. Wê çaxê wê hînbûna ziman pir hêsan be. Li dijî gotinên dagirkeran gelê Kurd bi hemû zaravayên xwe di zanabûna rastîyên xwe de ye. Kurmancî, Soranî, zazakî û Goranî hemu zaravên Kurdî ne. Yekîtiya zimanê Kurdî, ji

dewlemendiya van zaravan tê. Ev çar zarave bi hemu awayî ve gencîniya zimanê Kurdî ne. Îro ev gencîne jî bo lêkolînên dewlemend li benda zimanzanan û gencînevanan e. Ji ber vê yekê divê gelê Kurd êdî bi zimanê xwe, bi nîrxên xwe, bi dîroka xwe dezgehên xwe yên netewî sazbike. Ev armanca han jî berpirsiyariyeke giran dide ser milê rewşenbîrên Kurd.

Gelê Kurd, ji bo jîyaneke azad û serbixwe, ji bo nîrxên mirovahî yên gelemperî têdikoşe, tîrêjên têkoşîna gelê Kurd li seranserê welêt belav bûye û îro rindtir rêya rizgarîya netewî û çînî ronî dike. Em îro li gor doh hîn nêzîkin jî bo rojên azad. Em bawer dikin ku gelê Kurd, di nav malbata mirovahîya pêşveçûyî de cihê xwe yê azad wê di demeke nêzîk de bigire.

Ez vê nivîsara xwe bi banga ku ji alîyê yekîtiya malbatên Mezopotamya ve hatibû kirin, diqedînim û dibêjim: Hevalno, hogirno, "Bi serbilindî, bi kêfxweşî, bi dildarî BÎ KURDÎ BÎFİKÎRÎN, BÎXWÎNÎN û BÎNÎVÎSÎN"...

Cano AMEDÎ

* Ev nivîs di sala 1995 an de hatibû nivîsandin. Lê, ji ber ku hê jî jîndariya xwe didomîne, me xwest ku di rûpelên Dengê Me de cih bigire!

Min goranîm nedizanî
Hêjarekan feryan kirdim
Min turebûnim nedezanî
Zorderakan feryan kirdim.

HELMET

ULUSAL BİRLİK VE İTTİFAK

Ezilen, sömürge bir ülkenin kurtuluş mücadelesinde, ulusal birliğin yaratılması ve sınıflar arası ittifakların zorunluluğunun bilinmesine karşın Kürdistan'daki bütün ayaklanma ve direnişlerde bunun yaratılmadığı bir gerçektir.

Geçmiş ulusal ayaklanmalarda bunun yaratılamamasının sosyo-politik ve sosyo-ekonomik nedenleri mevcuttur. Sorunun bu yanı tarihsel bir konu olduğundan bu kısa makalede buna değinmeye gerek yoktur. Fakat kısaca ulusal birliğin oluşturulmasının nesnel ve öznel koşulları, o günkü verili durumda yoktu diyebiliriz. Ancak bugün içinde bulunduğumuz koşullar, gerek K.Kürdistan'da 84'ten bu yana devam eden direniş hareketi, gerekse de G.Kürdistan'da kesintiler ve yenilgilerle de olsa gelinen "son" aşama ulusal birliğin nesnel koşullarının oluştuğunu gösteriyor. Fakat öznel faktörler, yani parti ve örgütlerimizin iradesi (yoksa iradesizliği mi desek?) bunu yaratmaya bir türlü elvermiyor. Bu konuda ciddi yanlışlar ve zaaflar mevcuttur. Ve ne yazık ki bu da ulusal kurtuluş mücadelesinin kazanımlarını ve zaferini engellemektedir.

Kürt ulusu sınıflara bölünmüştür ve doğal olarak da her sınıfın kendisine has ideolojisi ve çıkarları vardır.

Ulusal devrimini yani burjuva devrimini gerçekleştirmiş ülkelerde, temel sınıflar arasında bir mutabakat mümkün değildir. Ancak ezilen-sömürge ve ulusal demokratik devrimini gerçekleştirmemiş bir ülkede (yani bizde) bu sınıflar arası mutabakat olmazsa olmazdır. Fakat Kuzey ve Güney Kürdistan'da bunun tam tersi gerçekleşmekte, değişik sınıf ve katmanların temsilcisi olan partiler, birbirlerini bitirmekle meşgul gibiler. Bu

konuda, tuzu kuru bazı kesimler ve şakşakçılar, bu iç-savaşın ulusal birliği sağlayacağı kehanetinde bulunuyor, Alman ve İtalyan birliğinin bu çatışmalarla oluştuğunu söyleyebiliyorlar. Bunlar hem olguları birbirine karıştırıyor hem de Kürt toplumuna yabancı olup onun sosyal dokusunu anlamıyorlar. Olguları karıştırıyorlar, çünkü; gerek Almanlar gerekse de İtalyanlar sömürge değildi. Yükselen burjuva devrimlerin; feodalite ile burjuvazinin egemenlik savaşları ve bunun yansımalarıydılar. Kürt toplumunun sosyal dokusunu anlamıyorlar, çünkü; Kürtler arası bir savaş hangi nedenlerle başlarsa başlasın, durdurulması artık savaşı başlatanların iradesinden çıkmaktadır. Çünkü dökülen her damla kan, Kürt toplumunun yapısı yüzünden yeni çatışmalar yaratmakta ve ayrıca bu çatışmalarda fayda gören bir dış çeperin sürekli varlığı, bunu, yani çatışmaları kışkırtmaktadır. Kürt ulusu sınıflı bir toplum olmasına karşın, K.Kürdistan'da kendisini değişik sınıfların temsilcisi olarak addeden partiler yok. Daha doğrusu, neredeyse bütün partiler kendisini sosyalist ve işçi sınıfının temsilcisi olarak lanse ediyor. Partilerin kendilerini böyle değerlendirmeleri, onların gerçekte öyle oldukları anlamına gelmez. Onları ancak, talepleri, bileşimleri ve mücadele yöntemleri ile tanıyıp sınıflandırabiliriz.

Bugün Kuzey ve Güney Kürdistan'da ulusal mücadeleye öncülük eden ve kitleselleşen partiler arasında görece farklar olmasına rağmen, hiç birisi gerçek anlamda sosyalist ya da işçi sınıfı partisi değildir. Bu nedenle de ulusal birliğe sığ bakmakta, hepsi birliği, kendisiyle birlik olarak kavramakta ve ulusal birliğin ve ittifakın stratejik ve

taktik yönlerini anlamamaktadırlar. Bu nedenle de aralarında zaman zaman korkunç tahrip edici savaşlar sürmekte, birbirlerine sömürgecilerin verdiği zarardan daha fazla zarar vermektedirler. Elbette bu sonuçta, Güneyli partilerin inisiyatifi, PKK'den çok fazladır. Güneyli partilerin sınıf yapılarının feodal-burjuva karakterde olması, bu sonucu kolayca doğurmaktadır. Ancak, PKK sınıfsal olarak sol-küçük burjuva radikalizmini temsil ettiği halde, yine de bu çatışmalarda yanlış değerlendirmelerde bulunduğu ve pratikte birçok hata ve zaaf içinde olduğu, gözardı edilemez bir gerçektir. Ne Güneyli güçler ne de PKK karşılıklı olarak birbirlerini anlamaktan uzak görünüyorlar. Ve hepsi de bu çatışmaların dışında kalan parti ve örgütleri, taraf olmaya zorlamaktadırlar. Ve yine birbirleri aleyhine değişik sömürgeci güçlerle ilişki içine girmektedirler.

Özellikle KDP, son zamanlarda YNK'ye karşı Saddam'la, PKK'ye karşı TC sömürgeciliği ile girdiği ilişkilerle tam bir ihanet görüntüsü veriyor. KDP ve YNK bugünlerde (Eylül 98) TC ve batılı bazı devletlerle yeni arayışlar içine girmişler ve Kürt halkının kurtuluş mücadelesini yükseltmekten uzaklaşmış, kendi küçük gurupsal ve ailesel çıkarlarının peşine sürüklenmişlerdir. Güneyli güçlerin, sömürgeci devletlerin Kürdistan üzerinde inisiyatif oluşturmalarına mücadele etmelerinin hiç bir haklı sebebi yoktur. Sorunlar ne olursa olsun, bunların ulusal çerçevede çözülmesi gerekir.

Körfez savaşından sonra, Güneyli güçlerin kazandığı inisiyatif, ne yazık ki; kendileri tarafından emperyalistlere ve sömürgecilere kaptırıldı. TC'nin Güney'e "dostluk"

göstermesinin altında, Kuzey'de PKK'nin gerçekleştirdiği direniş hareketinin varlığı yatarken ve TC Kuzey'deki hareketin Güneyle birleşmesinin yaratacağı sonuçların Kürtlerin kazanımı olduğunu iyi bildiğinden; bu birleşmeyi bütün gücüyle engellemeye çalışmış ve engellemiştir de. Oysa KDP, TC'nin bu anlamda kendisine mecbur olduğunu anlasaydı, yani PKK'nin varlığının TC'yi kendisiyle ilişkiye zorladığını kabul etseydi, PKK'nin güç kazanmasına karşı çıkmanın doğru olmadığını kavrayabilirdi. Fakat KDP'nin kavrayamadığını TC iyi kavradı. Hem "peşmergeyi" PKK'ye karşı kullandı hem de sağladığı bu ilişkiyle Güneylilerin kurumlaşmasını engelledi ve onları birbirine düşürerek, bazı başka tezgahları geliştirerek Güney'de de varlığını kalıcılaştırdı. Ve şimdi son Ankara ziyaretinde Barzani'ye dayatıldığı gibi Güneylileri Bağdat'a bağlanmaya mahkum etmektedir.

PKK ise bu süreçte, Güneylilerin içinde bulunduğu durumu, ilişkileri ve sınıf yapılarını kavramamış ve onları hep ihanete hazır, yok edilmesi gereken güçler olarak algılamış ve ikinci 15 Ağustos gibi trajik yönelimlerde bulunmuştur. Güneyli örgütlerin, Güney'in sınıfsal yapısının bir yansıması olduğunu ve iyi-kötü yarım yüzyıllık bir mücadelenin üstündü yükseldiklerini gözardı etti. PKK tekçi ve çoğunlukla yanlıştan doğruya giden ideolojik yapısı ve mücadele anlayışı ile en başta kendi yarattığı ulusal direnişin ciddi kan kaybına sebep olmuştur. Ancak bu PKK'nin şimdiye kadar Kürdistan'da yaratılan ulusal hareketler içinde modern tek ulusal kurutuluş hareketi olduğunu ve içinde zafer nüvesini taşıyan bir yapı olduğunu inkar etmemizi getirmez.

PKK şimdi yeni bir siyasi, ideolojik bir

kavşakta gözükmemesine karşın esas olarak onbeş yıldır kesintisiz ve son yıllara kadar Kuzey'deki yükselen ulusal kurtuluş mücadelesinin tek önderi ve sorumlusu konumundadır. (Bu mücadelede sosyalistlerin rolü ise şimdilik konumuz dışıdır ve yine PKK'nin ideolojik ve politik eleştirisi de ayrı bir konu olduğundan şimdilik konumuzu ilgilendiren tespitlere geçiyoruz.) Bugün artık bu mücadelenin zafere ya da en azından kalıcı bazı sonuçlara ulaşabilmesi, PKK dahil Kürdistanî örgütlerin ulusal birlik ve ittifakla sömürgecilerin ve dünya kamuoyunun karşısına çıkmasıyla mümkündür. Kürdistan'ın parçalanmışlığı zaten yeterince büyük bir sorundur. Ek olarak, örgütlerin yanyana gelmezliği, ulusal birliğe ve ittifaka zarar vermektedir. Daha önce Kuzey'de "Ulusal Cephe" çalışmaları ne yazık ki başarıya ulaşmadı. Bunda hata payları az ya da çok olanlar tartışılabilir. Ancak bu şimdi pek yararlı değil. Fakat genel bir kanı "Pkk eğer cepheyi isteseydi ve önemle üzerinde çalışsaydı" bunun yaratılacağı şeklindedir. Ulusal cephe oluşmadığı için de yerine ikame edilen "parlamento" ve "ulusal kongre" gibi kurumlar eksik ve yanlış anlayışlarla doğmakta, paylaşımcı değil de dayatmacı bir mantıkla yaklaşılmaktadır. PKK önderliği, defalarca birlik çağrısı yapıp bu temelde getirilen her şeyi imzalayacağı açıklamasında bulunmuştur. Ancak bu konuda çalışma ve eğer imzalanacak bir belge çıkacaksa bu en başta PKK önderliğinin kendisine düşer. Belki iyi niyetli ve kendine güvenden kaynaklanan bir yaklaşımdır. Ama ulusal birlik ve ittifakın oluşturulması daha kapsamlı, çerçevesi çizilmiş talepler ve yaklaşımlarla yaratılabilir.

Bütün bu tespitlerden sonra sonuç olarak

ulusal birlik ve ittifak yaratılabilir mi? Bu soruya tek yanıt vermek gerek; hangi sınıfı ve katmanı temsil ederlerse etsinler ve içinde bulundukları konum ne olursa olsun Kürdistanı bütün parti ve örgütler en basit bir kazanımı dahi ancak bu birliği ve ittifakı sağlayarak elde edebilirler.

Güneyli güçler, Irak merkezi yapısının emperyalistlerle olan sorunlarının yarattığı konjonktürel durumun kendilerine sağladığı hareket ortamını iyi değerlendirmek ve kalıcı kurum ve kazanımların oluşturulmasının zorunluluğunu görmelilerdir. PKK ile ve kendi içlerinde girdikleri çatışmaların hiç bir kalıcı kazanım getirmeyeceğini ve sömürgeciler tarafından yutulmaya hazır bir ortam yaratacağını anlamalıdır.

PKK ise bu hareketlerin önderliklerinin tavrıyla bu partileri yargılamamalıdır. Bu önderliklerle ideolojik mücadele daima mümkündür. Bu önderliklerin bulunduğu konum ve ilişkiler, bu hareketlerin arkasında bulunan yüzbinlerce kürt insanının özgür bir Kürdistan umudunu görmemizi engellememeli. Reel sosyalizmden gelen yanlış bir anlayıştan, yani bu tür ulusal hareketlerde işçi sınıfı partisinin, diğer sınıf ve katmanların partileriyle ilişkiyi taktik bir ilişki olarak değerlendirmesinden ve bulabildiği ilk fırsatta bunların fiziki tasfiyesine yönelmesinden vazgeçmek gerek. Çünkü gerekli koşullar oluşursa pekala taktik ilişkilerin stratejik ilişkiye dönüşmesi mümkündür.

Ulusal birlik ve ittifak hiç bir partinin üzerinde seçim yapabileceği, yani vazgeçebileceği bir nokta değildir. Bu sömürge Kürdistan'ın bize dayattığı tarihsel bir zorunluluktur. Beğensekte beğenmesekte elimizdeki malzeme budur ve yemeği bu

malzemeden yapmak zorundayız. Kürdistan'ın bunu feda etmeye, yeni bir baharı beklemeye dermanı yoktur.

Son sözü Kürdistan'lı sosyalistlerin konumuyla ilgili bir cümleyle kapatıyoruz. Eğer bugün Kürdistan devrimi sosyalistlerin öncülüğünde yürütülüyor olsaydı bugünkü sorunlar bu tarzda olmayacaktı. Ancak şimdi tarih başka şekilde yazılıyor. Eğer bu tarihi sosyalist bir tarzda yazmak istiyorsak, politik ve tarihsel ağırlığımıza denk araçları ve yöntemleri hemen oluşturmali ve harekete geçirmeliyiz. Sosyalistlerin bu ağırlığını ortaya koyması aynı zamanda diğer sözkonusu güçlerin doğru duruş göstermesini mümkün kılacak, kolaylaştıracaktır.

Hasan ZELAL

* * * * *

İKİ IRMAKLA

kanamış dizlerine aldirmeden top koşturup
intifada'da generalse yedisinde çocuk
botan'da serhıldan'ın önünde yürüyorsa

kadın

güney afrika'da, şili'de, halepçe'de
haber dinliyorsa güneşin kara oğlu
ağaç damar damar yayılır toprağına
çiçek yapraklanır kokusu-rengi yayılır
çeker orman üstüne yağmuru

şimşegiyle bulutu

şafak söker yıkılır duvar

bir köşe başında

fırat ve dicke gibi

dağlardan gelip

geride bırakarak mezopotamyamızı

kavuşur, kucaklaşır, karışırız birbirimize

tek bir ırmakta iki yürekle ulaşırız

kızıl deniz'e

Ali BİÇER

DÎROKÎM EZ

Ez dîrokim
dîroka belangaza, çepera bindesta me
ava mirovahîyê nanê biratîyê me
heval û hogirê kedkaran
birayê gelên bindestim

axa min Mezopotamya ye
warê min kurdîstan e
Ez têkoşerekî nûjen
hevalê Spartakus, Kawa yê hesinkarim
ji Nînova û Roma vir de
şûr û çakûç di destê min de ye

İro, kulîlk û kevokên min
çiya çiya digerin
wekî teyrên baz
çiya ji xwe re war didamizrînin
Law keç bi xwîna xwe
navên xwe di kolin li ber navê min

Û bê tirs
li ser enîya dijmin
doza xwe dinivîsînin
bi bîrûbawerî, bi hêrsek zanayî
êrîş dikin ser dijmin
wek Dicle, Ferat û Munzur
serî rakirine şoreşgeran hemdem

Dilê min wek kela kela payîzê dikele
tilîyên min bûne pênoş
gulan direşînê
li ber dîlana azadxwazan
diz, rovî û çeqel ketine tayê
taya windakirinê, tirsê mirinê

İro, li Mahabat'ê, Bahdînan û Botan
Li Kanişlo û Amed'ê dîlan e
Ev dîlan, dîlana Mem û Zîn e
Xewna hezar sala ne. Cano Amedî

JÎYANA RÊXISTÎNÎ Û RÊBAZÊN TEKOSÎNE

Li cîhanê û welatê me pirsgirêkên ramiyarî û civakî, her ku diçe mezin dibin. Ev kêşe bi awayekî gelek êşkere xwe didin xûya kirin. Lê belê, bi giştî, nîqaşên ku li ser van arîşeyên politîk tên kirin, gelek hêsan û rûkîn in. Maweya nêzîktêdayîneke bi vî awayî, di cîyê xwe de sekinîn e, ango ji paşveçûnê zêdetir ne tiştêk e. Yên ku tozek rast nêzîkî meselan bûne, kariye gawek pêş ve here û li ser pê bisekine. Li hêla din, yê ku bi awayekî hêsan nêzîkayî lê nîşan dane, nekarîne li ber bayê pirsgirêkan bisekinin û li hemberê arîşeyan hatine ber fetisînê.

Berî her tiştî, rewşa ku welatê me tê de ye, pêwîste baş were nirxandin. Bi taybet pêvajoya ku em tê re derbas dibin, divê berîya politîkayên taktîkî, yê esasî bîr destnîşan kirin. Di pêvajoyekî weha grîng û nazîk de, ji bo rêber û girse bîgihîjin hev, mercên em tê de ne baş werin berçav kirin. Her çiqas kêşe bi awayekî hêsan bîr xûya kirin jî, lê belê dema ku em yekoyek tên pêşberên kêşeyan, em rastî zehmetiyên çareserkirina wan tên û tengezar dibin. Gelek tişt hatine guhertin û rewşa ku em îro tê de dijîn naşibe mîna salên 70'î û 80'î. Rewş û dem pir guherîne. Politîkaya îroyîn ne wek yê dema berê ne. Ji ber ku mercên cîhanê, bi awayekî giştî guherîne. Berî her tiştê, dijminê gelên bindest û çîna karkeran di xwe de guherîn çêkirîne û îro baştir dikarin rûyê xwe veşêrin. Lê rastîya xwe bi awayeke cuda nîşanî gelan didin. Yê ku li hemberê dijminê gelan û dagirkeran rawestîyane jî, nekarîne politîkayên wisa biafirînin, ku leyistokên serdestan vala derînin. Her, politîkayên klasîk tên bikaranîn. Nêzîkbûneke bi awayî jî, kêrî pêxistina bizava şoreşger nayê.

Di polîtîkayê de tiştêkî bingehîn heye ku, hêza li hember çiqas guhertinên nû bike û rêbazên nû bikarbîne pêwîst dike ku ji wî bêtir biguherîni û her tim gavek li pêş bi. An na, bi metodên dembîhûrî pêşketin û serkeftin gelek zehmet e.

Di bizava şoreşger a Marksî ya cîhanê de, bi giştî rewşek weha heye. Nemaze, li Kurdistan ev rewş bûye sedema qeyranek mezin û sexttir. Teqrîben 20 sale têkoşîneke çekdarî li bakûrê Kurdistan dom dike. Bi taybetî ji salên 90'î û hirve di hemû hêlan de guhertinên mezin çêbûne. Berî her tiştî, belavbûyîna demografîk û bingeha aborî û civakî û her weha li hêla siyasî û çandî gelek tişt guherîne. Gundîyên Kurd ref bi ref ber bi bajarên mezin ên Kurdistan û Tirkîyê ve bi destê dewleta dagirker ve hatin koçkirin. Ev bajarên ku bi sedhezaran koçberên Kurd ve tije bûne, xwedî ew derfetane ku karibin ewqas însanan bihewînin. Li welatê weha, wisa bi awayekî hêsan li arîşeyan nêrîn û wek berê bi ser kêşeyan de çûyîn, encamek baş nade. Ev rastî eşkere ne. Herkes li ser wan xwedî zanîne ye û wan rastîyan tîne zimên jî. Lê belê di çareserîya van de helwestên me yên pratîk xelet, hewldanên me qels in. Bi gotina Lenîn: "Bes zanîn û qebûl kirina Marksîzmê, mirov ji kêmasî û xeletîyan xilas nabe." û dîsa Lenîn: "Ger em nizanibin çawa êrîş bibin û ger em fêrî bi şiklekî guncaw şûnve vegerîne nebin, divê bête zanîn ku serkeftin nepêkan e." Bawer dikim ev gotinên Lenîn mijara me baş ronî dikin. Ango pejirandin û têgihîştina rastîyan tiştêk cihê ye, pêkanîna wan cihê ye.

Dema em rewşa gel û welêt û ya dijmin dinirxînin, em digihên wê encamê, ku berî her tiştî li hemberî dijminê gelê Kurd ê bêeman

têkoşîneke çekdarî tund dayîn, bo şoreşgerên vî welatî erkeke hewceyî û eşkere ye. Necihanîna vê vatîniyê bêberpirsiyarî ye.

Jî bo alternatîfbûna pergala împeryalîst û dagirkeran, du xalên grîng hene. Ya yekem; di warê ramyarî û bîrdozî de bibîryarî tevgerîn, duduyan jî; di jiyana rêkxistinî de esas girtina rêzkarîyê (dîsîplîn) ye. Li şta ku ji bizava sosyalîst a şoreşger kême, bicihanîna van pêwîstîyan e. Li herêma em tê de dijîn, guhertinên ramyarî roj bi roj çêdibin. Divê em jî pêşda van guhertinan bibînin û li gorî wan pêşgirîyên xwe bistînin û taktîkên nû biafirînin.

Rêzkarî jî di cîvaka paşmayî de bi du awa tê meşandin. An di nav rêkxistinê de despotîzm tê bikaranîn; rêxistin li alîyekî dimîne û şexs derdikevin ser her tiştî. An jî, bi navê rêzkarîyê bêrêzkarî û kekoyî tê jîyîn. Bi ramana azadiya kesayî, kaos û bi serê xwe hareket kirin e. Dema ku rastîya me bi vî awayî be, baş diyare ku ramanên me çendî têkûz bin, nîyeta me çendî başbe jî, di armancên xwe de encam girtin bo me zehmet e. "Pêwîst e partiya siyasî ya prolîtarya di nav refên xwe de xwedî rêzkarîyeke tund be û rêveberîyeke navendî bîne pê (Lenîn)" Vekirî ye ku tevgera sosyalîst ji van rêbazan gelek dûr e.

Di tevgera sosyalîst û rizgarîxwaz de nexweşîyeke din ya mezin jî, tevlihevkirina vatîniyên pêşanî û duwem e. Li rewşa ku welatê me tê de ye, gelo pêwîstî bi gengeşîyên li ser rêbazên têkoşînê heye? Şert û şîrûdê ku Kurdîstan tê de ye, aşîkar e. Hawîrdora welatê me bi dijminan ve hatiye girtin û dijminên gelê Kurd jî tevkujîyê zêdetir tiştêkî nizanin. Di mercên Kurdistanê de ji bo alternatîfbûna li hemberî hêzên împeryalîst û dagirker û hêzbûnê di têkoşînê

de rêya herî grîng, şerê gel e. Pêwîste, em vê gengeşîyê daynin alîyekî û rojekî zûtir dest bi karê pratîkî bikin. Welatê me di nav bera çar dewletên dagirker de hatiye parvekirin û van xwîn û keda gelê me heta dawî mijîn e. Li hemberî vê rastîyê, ji bo çareserîya kêşeya netewî ji rêbaza şerê çekdarî wêdatir tu rê maye gelo?

Bizava rizgarîxwaz a Kurd ji destpêka sedsala me heya salên 60'î, 70'yî di warê xwebirêkxistinê de ji pergalên nûjen dûr maye. Piştî van salan ev digore û rêkxistinên nûjen derdikevin. Lê ji ber gelek sedeman bersiva wê demê nayê dayîn. Dikare bê gotin ku, ji 84'an heyanî destpêka salên 90'î, PKK'ê bi tevî kêmasîyên xwe, di mercên wê demê de bi taktîkên di cîh de gavên grîng avêt. Lê dijmîn gelek guherî û bi teknîkeke nûjen û bi metodên zanistî çû ser her tiştî. Li hemberî vê bizava rizgarîxwaz a Kurd her metodên kevn û dembihûrî bikaranîn û demek şûnve têkoşîn xetimî.

Edî hewceye em teknolojiya şer biguherînin û hecetên pêşvetir ên şer bikarbînin. Herçiqas di şer de hêmana vîna însên xwedî grîngîyekî pêşanî be jî, pêwîst e îro teknolojiyeke nûjen bête bikaranîn li hêla din, herçendî cîyê wek navenda şer bête nirxandin jî, divê di navbeyna vî warî û têkoşîna li bajaran de lihevhatinek hebe. Ango, pêwendîyeke diyalektîk divê. Di vî karî de serketin jî bi hebûna kadirên xwedî wesif ve çêdibe. Ji hejmarê pirtir kalîteya kadiran grîng e. Ji bo di bajaran de tevgerîneke nûyî xurt çêbe û têkoşîn geş be, pêwîstî bi livbazîyên leşkerî, ku karibe di nav gel de deng vede û bandorek li ser bihêle, heye. Ji bo vê jî hewceye bizava rizgarîxwaz a Kurd navendeke şer a nûjen biafirîne.

Ji bo hin gavek weha bê avêtin pêdvî bi
tevgerêke nûjen û sosyalîst heye. Di mercên
îroyîn yê Kurdistanê de ev tevger, PYSK ye.
Lewra PYSK xwedîmirat, ezmûn û kevneşopîyeke
grîng e û her weha xwedî xêza bîrdozîyeke
Marksî-Lenîni ye. Û bi van taybetmendîyên xwe
dikare ji bin vî barê rabe.

Sefîn KOSORî

UMUT

savur saçlarını rüzgarda
bir aşkın sevişmesine kuytuda
suyun ürkek ve hızlı donanımına
dağın esrarına bırak benliğini
ve ezgisine namlunun
ve sıcaklığına süzül bir
bak dokunduğun tetikte
bak omuzundaki süngüde
her kurşunda nasıl be gülüm
nasıl da büyüyor umut.

dağın harmanladığı sevdada bu
bu sevdaki işçinin terinde
esmer dağlı Kürt kızının
buruk yüzünde yasaklanan gülüşte
sömürülüşünde, ezilmişliğinde
açlığında çıplaklığında yoksulun
yoğrulup dağlara yangın serildi...

serili yangında renk renk çiçekler
bahar soluğunda bir dünya düşler
çiçekte öz seni gizler
asi sevdanın dağlar vurgunu yüreği
bir özlemdir tarihten
bir özlemdir dağları kuşatmış böyle
sarmış her yanını isyansın!
bak dokunduğun tetikte
bak omuzundaki süngüde
her kurşunda nasıl be gülüm
nasıl da büyüyor umut.

M.MAMAŞ

ŞOREŞA KURDISTAN, ROLA "BAKÛR" Û PARTIYA ME

Di dîroka Kurdistan de serhildanên netewî yên herî mezin li Kurdistanê bakûr destpêkirine. Di wan çaxan de pêşengîya şoreşa Kurdistan di vê perçeya welatê me de bû. Lê piştî serhildana Seyîd Rîza, pêşengîya şoreşê ket li ser milê Kurdistanê başûr. Herçiqas di pêvajoya Komara Mahabad de ev pêşengî li ser Kurdistanê rojhilat veguhastî be jî, piştî têkçûna wê, ev vatîni dîsa ma li ser Kurdistanê başûr. Ev rewş heta salên heftêyan dom kir. Di vê demê de li Kurdistanê bakûr hişyarbûneke netewî bi awayekî nûjen destpêkir. Bi taybetî piştî ku li Başûr di sala 1975'an de şoreş têkçû, rûyên hemû Kurdan zivirîn ber bi Kurdistanê bakûr.

Di rastîyê de rola Kurdistanê bakûr, di têkoşîna netewî ya Kurdistan de sereke ye. Egerên vê rolê; him ji hêla dîrokî ve, him ji hêla aborî ve, him ji hêla ardnîgarî û ramyarî ve pêktê. Dibe ku, şoreşa 1991'an a li başûrê Kurdistan, wekî dij bi van dîtinan bê destnîşankirin. Lê ger mirov ji nêzîk ve bala xwe bide vê şoreşê, bandora bakûrê welêt dê bi hêsanî bibîne. Dema ku li Kurdistanê başûr rapêrîn çêbû, li her derên Bakûr serhildanên girseyî wekî kulîlkên biharê dibişkivîn. Wê çaxê jî Komara Tirkîyê ji naçarîyê hin mafên çandî ya Kurdan jî pejirandibû. Ji bilî van jî, di rapêrîna Adar'ê de rêxistinên Bakûr û Rojhilat jî cih girtî bûn. Bi kurt û kurmancî, em dikarin bêjin şoreşa Adar'ê encama kar û xebatên hemû Kurdan bû û piştî hewl û koşîşa her çar perçeyên Kurdistan hilperî.

Lê piştî şoreşa Adar'ê avat û daxwaza çînên bindest pêknehatin. Çînên bindest ne di desthilatdariyê de, ne jî ji hêla aborî ve

bipêşketin. Reforma erdê jî, ji xeynî çend deveran çênebû. Herçiqas mêtinkariya netewî nema be jî, mêtinkariya aborî her berdewam bû û dikare bê gotin ku ev mêtinkarî jî berê jî bêtir bû. Pîvana demokrasîyê, bandora çînên bindest e ya ku li ser desthilatdaran. Ango; di welatekî de bandora çînên bindest li ser desthilatdariyê çiqas zêde be, demokrasî jî ewqas li pêş e. Lê mixabin çîna karker û cotyarên bêerd û xwedî erdên biçûk û tiwêjên din ên bindest ên li Kurdistanê başûr nekarin daxwazên xwe yê herî bi maqûl jî, bi Dewleta Federa ya Kurdistanê bidin pejirandin. Ji ber vê, şoreşa Adar'ê dibe ku şoreşeke netewî be, lê tu car nebû şoreşeke demokratîk. Şoreşa Adar'ê, destpêk bû lê dûmahika wê nehat. Herçendî, şoreş bi destê girseyên bindest ve çêbû jî, desthilatdarî bi saya partiyên burjuwa ket destê çînên serdest.

Gelo rêxistinên sosyalîst ên Kurdistanê başûr, rola xwe leyistin? Ciyê dax e, ku sosyalîstên başûr, piştî şoreşa 91'ê, xwe xistin çarçoveya, ku PDK û YNK bo wan danî bû. Polîtîkayên wan jî vê çarçoveyê derneket. Ew nebûn parazvanê mafên bindest. Li gor berjewendiyên karkeran û gundiyan xizan polîtîka neafirandin. Di dawiyê de gel ji van rêxistinên dilsar bû. Bi gotineke nehez, marjînal bûn. Ji ber van sedeman, li Kurdistanê başûr şoreş xetîmî. Niha di vê perçeya welatê me de jî her hêlan ve qeyranek heye. Lê hêzên burjuwa nikarin çareserîyek li vê qeyranê bibînin. Edî wan, rolên xwe yê şoreşger leyistin. Ew jî niha ve, di gelek mijaran de polîtîkayên paşverû dimeşînin. Eşkerekî ye, ku çareserîya vê qeyranê tenê bi xebata sosyalîstan wê pêkbê.

Li Kurdistanê Rojhilat jî, dema ku rejîma Şah Riza Pehlewî hat rûxandin, têkoşîna netewî gelek bipêşketibû. Piraniya Kurdistanê

rojhilat hatibû rizgarkirin. Di vê şoreşê de, Komela jî wek pertîyeke çep, pir bihêz bû. Lê ji ber şerê navxweyî û hin polîtîkayên çewt, hêzên Rojhilatî pir lawaz bûn. Rejîma nû ya îslamî jî, ji çewtiyên wan sûd wergirt û li ser Kurdistan dîsa desthilatdar bû, gund û bajarên rizgarkirî yek bi yek bidestxist. Piştî vê jî PDK-î bû du beş, Komela jî bi çend rêxistinên çep ên îranî ve yekgirt û bû hizbeke îranî. Piştî van bûyeran, tê dîtin ku Kurdistanê rojhilat jî êdî him ji hêla netewî ve him ji hêla çînî ve nikare bibe pêşenga şoreşa Kurdistan.

Rewşa Kurdistanê bakûr, ji perçeyên din ên Kurdistan'ê cihê ye. Êdî pêşengiya şoreşa netewî ya Kurdistan, li ser milên Bakûr e. Wek bi bilindbûna hejmara nifûsê, firehbûna xakê, nêzîkbûn û cînarbûna bi dewletên nemêtinkar, bakûrê welêt xwedî derfetên mezin e. Em dikarin bêjin potansiyela şoreşa netewî û çînî, ji ya perçeyên din ên Kurdistan'ê zêdetir e. Ji xwe ev potansiyel bi destpêkirina şerê çekdarî ya 1984'an, xwe da der û eşkere kir. Lê çawa ku têkoşîna netewî li perçeyên din xetimî, her wisa li Kurdistanê bakûr jî xetimî. Egera vê xetîmîna jî, eşkere ye, ku li Kurdistan'ê hêzên sosyalîst bi awayekî aktîf polîtîka namesînin û di têkoşîna netewî û her weha ya çînayetî de cîyên xwe yên resen nagirin. Hêza ku îro pêşengiya têkoşîna netewî dike, nikare pîrsgirêkên şoreşê çareser bike. Bîrdoza wê, stratejî û taktîyên wê, heta meriv dikare bêje asoya wê dest nade vê yekê. Hêza paldar a şoreşa me herçiqas daxwazên netewî be jî, ji dxwazên çîn û tiwêjên bindest serbixwe nîn e. Dibe ku ev yeka han bo sedsala 19'an negunce. Lê di sedsala 20'an de partiyên xwedî bîrdoza burjuwa, nikarin şoreşên netewî bi awayekî têkûz bibin serî. Belku; dikarin

têkoşîna netewî bibin merhaleyeke navincî ku li Kurdistanê jî rewş weha ye.

Di destpêka şoreşa netewî de piştgirîya tevahîya gel ne ewqas grîng e. Dibe ku bi piştgirîya herêmekê an jî tiwêjekê merhaleya pêşîn a şoreşê bê rawirtin. Ji xwe di merhaleya pêşîn a şoreşê de dijmin jî, dam û dezgehên xwe li gor şerê şoreşgerî, amade nekiriye. Lê bi bilindbûna têkoşîna netewî, dijmin jî hemû sazgehên xwe li gor wê birêkdixe. Bi vi şiklî merhaleya ewilîn diqede û têkoşîna netewî dikeve merhaleya duwem. Merhaleya ewilîn li her sê perçeyên Kurdistanê hat rawirtin. Piştî merhaleya pêşîn, êdî dijmin, çiqas ji dest hati be, sazgehên xwe li dijî têkoşîna netewî birêkxistine. Ji bo ku pêwendîyên gel û hêzên şoreşgerên netewî qut bike, hezaran gund vala kirine, bi çewsandinên nedîtî û pereyên bilind, artêşek ji cehşan avakiriye, dehan hezar mirov xistine zîndanên û bi hezaran kuştinkariyên kontrgerîla, tirs û xofek xistiye nav gel. Evana; taybetmendîyên herî berbiçavên merhaleya duwem in. Edî li Kurdistanê bi valakirina gundan, bingeha demografîk hatiye guherîn. Berê, piraniya nifûsa welêt li gundan rûdinişt. Lê niha li welêt, piraniya gel li bajaran dimine. Li gor hejmartina 97'an hejmara niştevana Amedê geştiye milyonekî. Her weha ya bajarên din ên Kurdistanê jî pir bilind bûne. Yê ku berê li gundan diman, pêwîstî bi gelek kereseyên bazara kapîtalîst nedidîtin. Danûstandina wan bi bazara yekgirtî ve gelek kêr bû. Jiyanê wan a aborî gelek girtî bû. Piraniya pêdvîyên xwe bi destê xwe çêdikirin. Lê niha ew, li bajaran niştecih in û naçarin ku pêdvîyên xwe ji bazarê bikirrin. Ev jî dibe sedema mezinbûna bazara kapîtalîst û pêşketina pêwendîyên kapîtalîst. Ji bo jîyanêke bi vî

corî, divê mirov xwedî hêza kirrînê be. Bo vê hêza kirrînê jî gel naçar e ku renc û keda xwe bi awayekî "azad" bifroşin. Di encamê de, li bajarên mezin ên Kurdistanê hêza karê pir daketîye. Di van çend salên dawîn de jî beşek ji burjuwaziya sinayî ya Tirkîyê çav berdaye vê hêza karî ya erzan. Bo vê çendê jî beşek ji sermayeyên xwe vediguhezînin Kurdistan, pê hin kargehên monteyî û yên ku berhemên çandinî bo bazara giştî amade dike, avadikin. Di encama van guherînan grîng de tê dîtin ku hejmara karkeran zêde bûye. Berî û niha ramanê hevbeş ên sosyalîstên Kurdistanê hebû-heye. Ev jî: ji ber kêmbûna hejmara karkeran, hêza paldar a şoreşa Kurdistan gundîtî ye û rola çîna karker pirtir bîrdozî ye. Dibe ku ev nêrîn bo îro jî derbas be. Lê rastîyeke eşkere heye ku, sosyalîstên Kurdistan bi saya vê ramanê, xwe ji çîna karkeran dûrxistin û çewtîyên xwe di bin kûrahîya vê ramanê de veşartin. Ev çewtî dibe ku, bo doh bê pejirandin, lê îro (piştî bihêzbûna çîna karkeran û bi giştî cihêbûn û zelaltirbûna çînan) nayê pejirandin.

Hêzên şoreşger ên netewî jî bo ku merhaleya duwem rawirînin, divê tevahîya çînan bindest birêkbixin. "Şoreş", bi gotina Lenîn "bêyî piştgirîya piranîya gel, nabe". Lê jî bo ku piştgirîya gel bê girtin, divê bernameyeke xwedî asoya şoreşa netewî û civakî hebe. Ger em berjewendîyên çîna û tiwêjen bindest ji niha ve neparêzin, nikarin piştgirîya wan bigirin. Bi gotineke nasyar: Şoreş, honandina hemû dijberîyên netewî û çînî yên civakê ne, li dijî împeryalizmê, mîjtkariyê û hevkarên wan ên li welêt. Xurtîya partîya sosyalîst a li welatê mêtîngeh û serkeftina wê ya stratejîk a mîsoxer ji wê tê ku: partî çawa parazvanê daxwazên netewî ye, her wisa li kargehan bi

gel karkeran, li dijî sermayedarên mêtinkar
doza mafê kedê dike. Li gundan bi gel
gundiyeên bêerd û xizan li dijî axayan û
dewleta dagirker doza belavkirina erdê dike.
Bi gel jinan, li dijî zordestiya mêran, doza
rizgarî û azadiya nîviya civakê dike. Bi gel
ciwanan, ji bo çareserkirina pîrsgirêkên
xweserî yê ciwanan têdikoşe. Bi gel
hindikahiye li welêt, li dijî dewleta
dagirker doza mafên hindikahiyan dike...

Ya ku çarenivîsa şoreşa Kurdistan nîşan
bike, Kurdistanê bakûr e. Li Kurdistanê bakûr
ji tenê hêzên sosyalîst dikare şoreşê bibe
serî. Li vir, partîya me PYSK, ji bo
bicîhanîna şoreşa netewî a demokratîk, ji
hêla birdozî ve, ji hêla dirokî û ezmûnî ve
xwedî hêza karîne ye. Le wekî em hemû ji
dizanin, partî di nav têkoşînê de qewî dibe,
di nav têkoşînê de kêmasiye xwe çareser dike
û bi vî şiklî digihîje partîyeke sosyalîst a
têkûz.

Munzur CANBEGÎ

Açar,
kan kirmızı yediverenler
ve kar yağar bir yandan
savrulur Karacadağ,
savrulur Zozan...
Bak, bıyığım buz tuttu,
üşüyorum da
Zemheri de uzadıkça uzadı
seni, baharmışın gibi düşünüyorum,
seni, Diyarbekir gibi,
Nelere, nelere baskın gelmez ki,
seni düşümenin tadı...

A. ARİF

SÖMÜRGEÇİ GÜÇLERLE İLİŞKİLER VE TAVRIMIZ

Bilindiği üzere Kürdistan, sömürgeleştirilip dört parçaya bölünmüş bir ülke. Bu sömürgeleşme ve parçalanma sonucu uluslaşma süreci kendi doğal seyrinden farklı, dış güçlerin müdahalesi sonucu çarpık gelişim göstermiştir. Her dört parçada birbiriyle görece farklılıklar içeren ekonomik, sosyal, siyasal ve kültürel bir şekillenme oluşmuştur. Bu parçalanma ve farklılıklar doğal olarak ulusal kurtuluş mücadelesine yansımaktadır. Her bir parçada mücadelenin seyri ve sömürgeci devletlerle ve uluslararası arenada girilen ilişkiler bir diğer parçaya göre farklı olmaktadır.

Her siyasal partinin, düşman cephesindeki ilişkilerden yararlanması, onu yalnızlaştırması ve kendi hareket alanını genişletmesi doğaldır. Bugün de Kürdistan'ı sömürgeleştiren devletler arasındaki ilişkilerden, emperyalizm ve sömürgeci devletler arasındaki ilişkilerden yararlanmak politika sanatının bir gereğidir. Bugün, sömürgeci devletler arasında eskiye nazaran daha derin ilişkilerin olduğu açık. Ama Kürt örgütlerinin bu sömürgeci güçlerle girmiş olduğu ilişkiler, stratejik olmamalı, var olan sömürgeci güçler arasında siyasal ilişkileri daha da derinleştirecek, genel ulusal çıkarlara uygun nitelikte taktik ilişkiler olmalıdır. Hatta, bu konuda Kürdistan tarihinde ders çıkarılacak birçok örnek vardır. Ama maalesef bugün, bütün bunlara rağmen bazı ulusal güçler tarihteki bu örneklerden ders çıkarmamakla birlikte bu hataların devamcısı ve savunucusu durumuna düşmektedirler.

Güney Kürdistan'da, 91 Devriminden sonra varolan siyasi güçler arasındaki iktidar savaşı sömürgeci güçlerin de müdahalesiyle

bir kısır-döngüye dönüştü. Sömürgeci güçler arasındaki ilişkilerden yararlanılması gerekirken, sömürgeciler ulusal güçler arasındaki ilişkilerden yararlanmasının çok iyi bildiler. Güney Kürdistan'da halk açlık sınırında yaşarken burjuvazi, siyasi nüfuzunu kullanarak ticaret, gümrük, petrol gelirleri ve dış yardımlarla payazlandı. Poyitik alanda bu sınıfın temsilcileri olan KDP ve YNK'nin ulusal çıkarları gözetken bir ekonomik ve siyasal politika izlediklerini söylemek çok zordur.

Her şeyden önce, bilinmelidir ki; bu tür ilişkilerde sömürgecilerde kendi çıkarlarını önplanda tutar ve bir Kürt devletinin kurulmasını kesinlikle engellemeye çalışır, gerekirse bütün ilişkilerini bir kenara bırakarak diğer sömürgeci güçlerle birleşip K.U.K.M.'ne karşı bir cephe oluşturur. Ama maalesef bazı ulusal güçler biri gerici, diğeri anti-emperyalist olmak üzere bölgede karşılıklı iki cephenin olduğunu ve anti-emperyalist cephenin içinde İran, Irak ve Suriye gibi sömürgeci devletlerin de yer aldığını ileri sürmektedir. Bu belirleme bile başlı başına bir yanılgıdır ve Kürt ulusal güçleri arasındaki ittifaklara zarar verir. Ulusal çıkarları korumak adı altında geliştirilen bu ilişkiler acaba Kürt ulusal çıkarlarına denk düşmekte midir?

Bugün herhangi bir Kürdistan'lı yurtsevere "Kürt ulusunun asgari ortak çıkarları nedir?" diye sorulacak olursa, sağlıklı bir cevap alınamaz. Aynı şekilde ulusal güçlerin çok farklı bir süreci izlemeleri de, gerçek anlamda genel Kürt ulusal çıkarlarını belirleyecek bir ulusal birlik platformunun olmamasından kaynaklanmakta. Ki eğer böyle bir ulusal birlik sağlanmış olsa, Kürdistanlı siyasi

güçlerin sömürgecilerle ve uluslararası platformlarda girecekleri ilişkilerde çeki-düzen verir. Bu ilişkilerinin Kürt ulusal çıkarlarına zarar vermesini engeller. Ulusal güçler arasında en üst düzeyde diyalogun geliştirilmesi ve enazından bir istişare mekanizmasının oluşturulması, yukarıda belirttiğimiz koşullar dikkate alındığında hayati bir önem taşımaktadır.

Partimiz PYSK, bu bağlamda her zaman bütün Kürdistanlı siyasi güçlerinin, kendilerini ifade edebileceği bir ulusal birlik platformunun oluşturulmasından yana olmuş ve bunun için gerekli çabayı sarfetmiştir. Aynı şekilde partimiz ulusal güçlerin, sömürgecilerle, ulusal kurtuluş mücadelesine zarar verecek, stratejik bazda ilişkiler geliştirmesine karşı çıkmış, bu ilişkilerin taktiksel bir çerçevede, diğer Kürdistanlı siyasi güçlere zarar vermiyecek şekilde olmasını savunmuştur. Yine Güney Kürdistan'daki PDK-YNK, PDK-PKK çatışmasına karşı çıkmış, ulusal güçler arasında doğabilecek sorunların, ulusal çıkarlar çerçevesinde, demokratik ve barışçıl yollarla çözümlenmesinden yana olmuş ve ulusal güçler arasındaki sorunların şiddet yoluyla çözümlenmesine karşı çıkmıştır. Bu yaklaşımının ne denli isabetli olduğu da olayların ve yaşanan gelişmeler ispatlamıştır.

AMED ŞENGALİ

Ew çî roj bû
Ew merivên bêzer û dilguman
Rêz bûbûn li quntarên çîyan
wê roja berf û bahoz û moran
Dilêş bûbun hemû çîyan
Bo wan mindal û zarokan
û bi hêstirên wan ve şuştibûn
Dolên xwe yên bikovan / Serhat

JI BO JIYANEKE NO GAVEK GIRING!

Ji mêj de mijara yekîtîyê di nav gelê Kurd û di nav hêzên ramyarî de tê lec kirin. Gava ku devê kê vedibe an dipeyive, qala hewcedariya yekîtîyê dikin. Vê dîtina xwe ji ewha tînin zimên: "Kurd ji xwe ra xayin in, ne wilo bûna wê di nav wan de aqûbet û aşîti hebûya, wê xwedîyê yekîtîyeke bingehîn bûna" dibêjin! Pirsê rastî, ev dîtina han mirov pê pirr acis dibe. Lê, di bin vê dîtina çewt de hinek rastî veşartî ne. Dibe em van rastîyan bibînin in û derxin holê.

